

## Alîkariya şirketan ji bo amedekirin û pêkanîna esahiya dualî

Cihê servîsa KAUSA ya herema Hannoverê projeyêke Ausbildung im Verbund pro regio e.V. e. Wek şîrîkê bibawer, em di her beşên esahiye- ji dest-pêkê, girtina cihên esahiye heta ezmûnê-em piştgiriyê didin şirket û şagirtên biyanî. Hûn dikarin herdem di cihê karê xwe, de bêheq, bi me bişêwirin.

## EXAM – Birêxistina esahiya ji derve (Externes Ausbildungsmanagement)

Em birêxistineke ji derve pêşkêşî şirketên piçûk û navîn dikin (bi kurtasî: EXAM – Externes Ausbildungsmanagement). Bi EXAM em alîkariya şirketan dikin, da cihên esahiyan çêkin û wan bihêlin:

### → Berî destpêka esahiye

- Li gorî pêwistiyê agahdariya berfireh li ser pergala perwede û esahiya Elman
- Şêwirmendiya bi şirketê re di derbarê cihê karê esahiye li gorî şirketê
- Piştgirî ji bo fermiyeta şirketê wek şirketa esahiye
- Alîkarî ji bo lêgerîna berendam û hilbijartina wan
- Alîkarî ji bo avakirina plansaziyeke esahiye
- Li gorî daxwaziyê, lêgerîna şirketêke şîrîkatiyê ji bo esahiya hevpar
- Alîkarî ji bo serlêdana pêşxistinê

### → Di dema esahiye de

- Şêwirmendiya bi şirket û şagirtan re ji bo her mijarên derbarê esahiye de
- Destek ji bo lêgerîna şêwazên alîkariya weke amadekariya ezmûnê
- Têkilî bi dayîre û dibistanên pîşeyê re
- Xilaskirina karên fermî
- Birêxistina civakî

## Çima pêşkêşkirina esahiye?

Esahî ne tenê karekî şirketan ê ji bo civakê ye. Ji bo misogerkirina aboriya şirketê di pêşerojê de ye jî.

### → Bilindkirina pêkhatina qerezi

Şirket dikare di esahiye de zanistiyên hindurîn ên pêwîst bide karkerên xwe. Bi vî awayî dibe xwediyê karkerên bi zanistiyên hindir (Insider). Şagirt gelek caran xwe bi şirketê didin naskirin û demdirêj di şirketê de dimînin.

### → Avantaşên girtina karkeran

Şirketek bi jîrbûn û pêkhatiya karkerên, pîşeya xwe li ba wan çêkirine, çêtir dizane. Lewma rîsk di hilbijartina karkeran de kêmtir dibe.

### → Xurtkirin û qezenca danasînê

Di dema esahiye de jî şagirt ji bo çêkeriya şirketê hêzek e. Esahiya di şirketê de dikare erênîya xwedanasînê li ba mişteriyên û raya giştî be.

**Kengê bixwazin, bi me re têkevin têkiliyê** û emê yekser jîvanekê amade bikin:

## KAUSA Servicestelle Region Hannover

bei Ausbildung im Verbund pro regio e.V.

Ausbildungsberatung für Selbstständige mit Migrationshintergrund:

**Walid Zein**

05173-92590-13

w.zein@proregioev.de

